# Bajarê heywanan



Aram ALÎ

Li bajarê heywanan şeveke bi baran e
Ji serî heta binî ez şil im
Kûçikê min ji zû de dev ji min berdaye
Çûk di hêlînên xwe de ne
Gêrik kişiyane binê erdê
Gumgumok ma jixwe razayî ne
Dengên dûr ên guran qut bûne
Û gelo masî çi dibêje ji bo vê baranê?
Em weke du şanogerên ne jêhatî bûn
Wextê şewqên erebeyan weke şewqên ser dikê li rûyê me xistin
Di vê dika cîhanê de
Di bin awirên têgehên mezin
û yên biçûk ku xwe mezin dibînin de
me nizanîbû bê em ê çi bikin
Serê min ji ber jiyana tevlihev, ew jî tevlihev bûbû
Lê ji rûyê te keziyên helbestên xweşik dadilqiyan
Min di wê kêliyê de ferq kir
Ku nefsa baranê me herduyan jî şil dike
Û li bajarê heywanan mirov jî dijîn

Û perde hate guhertin
Derhênerê hoste em herdu jî ji dikê daxistin
Şewqên ser dikê ewilî ji ser rûyê te, dûra ji ser rûyê min daketin
Her kêliyek temenek e, emrek e
Min ev dît, min ev jiyan kir
Û temenek bi te re wiha derbas bû....
Di qorziyeke şil a bajarê heywanan de çavên me gihan hev
Em wê çaxê tenê du cot çav bûn
Weke ku me hev nas dikir....
Ji bo hinekên din, em tenê du derwêş bûn
Yan jî tenê du "tişt"...
Heke eceleya vê dinyayê tune bûya
Şewqên erebeyan rûyên me ronî bikirina
Me yê ji helbesta te û ji çîroka min gelek tişt bigirtana
Û belkî jî bi salan em ê wiha mabana....
Niha hemû ewr vedirişin ser min
Mirin jî tê de, ji bo hemû êşan
mirov carna li bende ye hinek ber dilê me bigire
em ewqasî pê naêşin, lê çavên têgehên mezin li ser me ne.
Ruhên mezinan û namûs û wicdan û yên din
hertim li bende ne ku pênûsa me bişkînin.
Û paşê destek tê ser milê me
"mirov nikare bi kesên mirî re bimre"
Ev gotinên hêsan, gotinên beradayî dibin xelasker....
Îro cuda ye,
Îro temenekî cuda ji min çû
Wê bajarê heywanan demekê vala bimîne
Ez ê nikaribim helbesta bajarê vala binivîsînim,
Ez ê nikaribim behsa bajarê vala bikim
Wê qedeha min tije nebe
Wê destek neyê ser milê min
Wê kes ber dilê min negire...
Û belkî ez sûnd bixwum ku dîsa li serê qorziyan nesekinim.